

Polîtikayêن Dewleta Tirk Ya Çandkujî û Zimankujiya Kurd û Dengbêjî

Zeki Gürür

Ji destpêka dîrok, şareza û hebûna mirovahiyê heya roja me; gotin, deng û awaz, di çand huner û jiyana temamî mirovahiyê de cîheke pir mezin girtiye. Di olên semawî, mîtolojiya rojhilata navîn û kevneşopiya Mezopotamyayê de gelek mînakên zîndî ya hêza gotinê heye. Gotin bi qasî hebûna destpêka şarezaya mirovahiyê di kûrahiya dîrokê de bi cih girtiye. An jî destpêka şarezayê bi gotinê dest pê kiriye. Têkiliya mirovahiyê çawa bi xwezayê û hebûna xwe ya ontolojîk ve destpê kiriye, gotin wekî nirxeke girîng, beranberî rastiya me ya biwatekirina hebûna xwe di bîr û xêva me de cihê xwe yê bêdawî girtiye.

Armanca vê nivîsê, di destpêka mirovahî û şarezayê heya roja îroyîn, veguhîna çanda kurdî, gotinên çîrokî û devkî çawa bi polîtikayê dewleta Tirk ve deformî bûye û ji bingeha xwe bi dûr ketiye. Di vê nivîsê de beriya her tiştî xebatêni li ser çanda dengbêjiyê û di desifrasyonê kilam û stranê dengbêjan de ev mijar çawa pêk hatiye û li gor pêvajoyê çawa bi pêş ketiye û hatiye asteke din. Wekî din di dîroka Kurd û Kurdistanê de bêpergalbûna kulyata nivîsê, xwe bi ci awayê bi pêş xistiye û çand û dîroka dewlemend û rengîn, çawa bi pêş ketiye? Di pêşveçûna nivîsê de têkiliya avabûna dewleta Tirk ya bi xîmê monîzma çand û huneran bi ci awayê li ser çanda Kurdî û bi taybetî jî dengbêjiyê bandor dike, paradoksên dewletê û tevgerên Kurdan yên têkiliya çandê bi ci awayê derdikeve pêş? Armanca dewletê ya deformekirina çanda Kurdan di bingeha xwe de ci wate û polîtikayan vedîşêre? Dengbêjî, bi taybetî jî çanda çîrok û gotinê kîjan demê ber bi paşveçûnê ve ket? Şerê PKK û dewleta Tirk, bi xwe re ci dejenerasyonê çandan anine?

Wekî din avakirina dewlet-netewe ya Tirk bi xwe re kîjan problêmên li ser ziman û wêjeya Kurdan anîye? Hebûna Kurdan bi ci awayê ji bo dewleta Tirk dibe sedemên pirsgirêkan? Avakirina paradîgmaya nasnameyê ya sîstema Tirk bi ci forman hatiye pê? Derbasbûna netewe-dewletê bi ci awayê çêbûyê û ban-

dora vê ferasetê li ser ziman û wêjeya Kurdî ci ye? Niqaşen pir-çand û zimaniyê bi ci awayê talûkeyê wedisêre û çend perspektifê vê rexneyê. Rêvebirina dewleta Kemalist, bi ci amûrên erkê li ser ziman û wêjeya Kurdan deformasyon û texribat cêkirine? Cûdatiya ziman û wêjeya Kurdan ji bo argumanê dewleta Tirk bi ci awayê hatiye bikaranîn? Zimankujî û çandkuji, qedexekirina nirxên çand û hunera Kurdan bi ci bertakan hatiye pêşewaz kirin? Çanda dengbêjiyê di valahiya vê yekê de erkeke çawa hildigre li ser milên xwe? Ji bo xebatên Kurdistan û Kurdewariyê qiymeta wan ci ye? Ev nivîs bi vê awayê li ser meseleyê disekine û perspektifeke Kurdewariyê di sedsala 21. de dide niqaşkirin. Heya roja îroyîn bêpergalbûna Kurdan ci pirsgirêk bi xwe re anîne? Bi teknik û metodoliya kulturolojiyê û derfetên civakên zanistî, analîzkirina çand û zimanê Kurdî, di naveroka vê nivîsê de bi cih girtiye. Û ev nivîsa bi tenê perçeya Kurdistanê ya li Tirkîyeyê li ser meseleyê disekine û perçeyên Kurdistanê yên din di naveroka vê nivîsê de bi cih negirtine.

Beriya her tiştî, divê di derbarê çanda dengbêjiyê de çend gotin werin kirin. Her ci qas navê wan bi me xerîb nebin jî, Kurd di dîrok û jiyana xwe de bi dengbêjan mezin bûn, runiştin, rabûn, coş û xiroş bûn, giriyan û qîriyan. Dengbêj jî bi parametreyâ kulturolojiyê, bi metodolojiya zanîstêن civakî û rêgezêن dîrokê, di hindurê xwe de gelek forman wedisêrin. Di navbera kevneşöpiya gotinê devkî ya Mezopotamyeyê de ekola Kurdan temsîl dikan. Çawa ku di dîroka wêjeya devkî ya Tîrkan de "Hozan" û "Aşiq" an jî di dîroka Fransiyâ de "Trabedour" hene, aşiq û trabedourên Kurdan jî dengbêj in. Lê ji bo fêmkirina çanda dengbêjiyê divê çend tiştên derbarê kulturê û dîroka devkî were kirin.

Kultur Netew û Problem.

Cultur di lîteratura sosyolojiyê de bi awayeke pir wate bi cih girtiye. Hem antropoloji û hem jî di ferhenga sosyolojiyê de cultur cihewaziya mirovan derdixe pêş. Ji prîmatan heyanî çêbûna xawêni û nirxên etîkê, cultur seranseñi bi mirovan ve têkildar bûye. Ji dawiya sedsala 19. şûnda jî, ji bo rêexistin û pêşvebirina neteweyan nirxeke pir girîng bûye. Bi dû şoreşa Fransiyâ, cultur û uniteyên girêdayî wê gelek hatiye nirxandin. Nivîsa dîrokî ya neteweyan bi girêdayî senifandina xebatên culturê hatiye pê. Ji wir ber bi roja me jî girîngiya vê fenomenê zêdetir di xebatan de cih girtiye. Her wiha milet û neteweyen ku yekbûna xwe pêk anîne bi saya serê xebat û karêñ çand û huner û nirxên gelî ev yek çêkirine. Her ci qas şarezaya Ewropayê bi dû sedsala 20. şûnda bi avayeke rasyonel û teknîkeke pozitivîst hatiye avakirin jî, di xîm û bingeha çand û şarezaya Ewropayê de gotegotên dema Yewnanan yên Antîkê û epopeyên Grekan bi cih girtine. Destan û efsaneyen sê hezar sal berê, niha di bingeha şarezaya Ewropayê de ne. Ew yek ji bilî Ewropayê, ji bo gelek neteweyan jî wisa ye. Ji ber ku, hebûna gel û neteweyekî di dîroka wan de veşartîne. Tiştê herî berê jî, ji bo gelan, efsane, çîrok, çîrokên gel in. Kurd di vê hêlê de gelek jî şansdar in.

"Eger şêr, heyâ xwedî dîroknasên xwe dibin, çîrokên nêçîrê her dem nêçîr-

vanan mezin û pîroz dikin”* Bi ser vê rastiyê, mirov dikare bibêje ku hîstorîographya Kurdan jî di berhemên Kurdan, yên di nav gel de veşartî ne. Bi mekanîzmeyê sazî û xebatêni bi vê awayê di jiyanâ Kurdan de mirov ber bi çanda Kurdan ya dengbêjiyê dibe. Heya niha xebatêni dîrok û çand û zimanê Kurdan bi derfetêni mekanîzmeyekê nehatine nirxandin, lêgerîn û lêpirsîn. Ew yek jî bûye sedema aloziyan û kuliyyateke cûr bi cûr.

Di dîroka dengbêjiyê de mirov dikare bibêje ku, çanda dengbêjiyê di bingeha xwe de fena hîn nirxên Mezopotamyayê yên destpêka dîrokê, hîn dewan dike. Wekî tê zanîn çanda Çargayê** rastî û efsûniya xwe bi ser dengbêjan dirêjî roja me dike û li benda xebatêni me ye.

Di ser de jî wekî tê gotin nivîsîna dîrokê (hîstorîographya), ji bo her netewî û monîzma avakirina dewlet û netewan gelek girîng e. Û gelek caran jî nivîsîna dîrokê ji bo manîpulasyonêni polîtîk û îdeolojîk gelek têni bikaranîn. Her dîrok nivîsî li gor rastiyêni civakan, yên siyasi, polîtîk û dîrokî, car caran jî zimanî, gelek guherbar û cûda bi cûda ye. Di avakirina dewleta Tirk, ya bi ser xîmê yekane hatiye çêkirin jî hîn rastiyêni çanda Kurdan di hindurê xwe de vedîşere. Her wiha di dawiya sazkirina dewleta Tirk, hemû çand û hunerên cûda hatine qedexekirin û têkiliya wan bi mêm û dîroka wan ve hatiye birîn. Navên bajar û gundan, navçe û ciyayan hemû hatine qedexekirin. Sedema vê ferasatê helbet bi avayeke îdeolojîk hatiye pê, lê divê bi avayeke rasyonel ev yek were analîzkirin. Ji ber ku ev qedexekirin di koka xwe de rastiya hebûna Kurdan û têkiliyan wan yên bi dîroka wan ve qut kirinê vedîşere. Ev rastiyêni ku heta roja me dirêj dibin, bi şert û mercen dinyayê, yên polîtîk, siyasi, û rewşa konjonkturê gelek cûdatî anîye. Loma jî, mirov dikare bibêje ku, her ci qas dinya û mirov biguhure, şert û merc cûda bi cûda bin, mirov mecbur bimînin ku bi çewtî û xeletiyêni xwe yên dîrokî ve rû bi rû bimînin jî, dewleta Tirk û pergala Kemalist hîn bi qebûlén 80 sal berê, yên dewleta Almanan û bûye sedem gelek şeran û gelek mirov hatine kuştin ve tê idarekiran. Çand û hunera kurdan - pêşketin, texrîbat- jî bi vê nêrîtandinêni dewleta tekane ve gelek zirar dîtiye. Gava ku mirov li polîtikayan dinihêre ev tişt gelek berbiçav in. Di hindurê 90 salî de temarêni gelekî, yên jiyanê hatine xitimandin. Xebatêni dengbêjiyê jî gelek bi van polîtikayan ve girêdayiye.

Tiştê ku çand û zimanê kurdî jî bo pergalê xistiye xetere, ne bi kurdan ve eleqedar e. Ji bo feraseteke zordar, tekane qedexeyan pîroz dike çand û zimanê cûda bi xwe talûke û bi pirsgirêk in. Lê ev yek jî bi xwe di rastiya çand û hûneran de hene. Gava ku mirov ji cûdatiyê bitirse hewce nîne ku ew kes Kurd bin. Bi vê yekê re girêdayî, mirov dikare ku tiştêni ku çandan ji bo sîstemeke tekane dibe xeteri weha bir êz bike:

- Civakî
- Dîrokî

* Gotinêni pêşiyêni Efrîkayîyan.

** Di dîroka Mezopotamyayê de çîroknivîsi an, çîrokbejî.

- Rakendî
- Fonksiyonelî
- Di nav tekiyê de pirî.
- Dînamîkî û guhêrbarî (Parıltı, 2006: 14-15). Ev yek dînamizma çand û huneran e. Ji bo tunekirina netewekî gelek pirsgirêkan derdixe holê.

Nasnameya Tirkan ya etnîk li ser vac û mantiqa yekane ava bû. Ji bo vê jî divê çand û hunerên gelêrî, yên cûda bihatiba qedexekirin an jî ji nîşandana xwedan çandeke dîrokî û rengîn divê bihatiba guhertin. Wekî hatibû plankirin, qedexekirin bi her awayê derket holê. Di nav şixulîna xwe de gelek jî encam da. Gel û netewêni li Tirkiyeyê dijîn bi awayê jenosîta ziman û çand, hatin deformekirin an jî di qadeke biçûk de man. Ji bo vê mantiqê pirsgirêka herî mezin Kurd bûn. Kurd ji avakirina dewleta Tirk heyâ iro bi awayeke qerebalix dengê xwe bilind kirin, serê xwe hildan û li ber xwe dan. Û bûn belayê serê dewleta Tirk (1925, 1927-31, 1930-32, 1937-38).

Polîtikayêni li ser çand û zimanê Kurdan, bi armanca guhertina kompozîsyona Kurdan hatiye pê. Hikumeta Tirk, bo ku ji vê armanca xwe sud werbigre di navbera sala 1920-1940an de bi sed hazaran însan ji Kurdistanê koçî der û de-verên din kir. Ji dawiya her serhildanê jî komkujiyên mezin kir û Tirkêni ji Ewropayê, li Kurdistanê bi cih kirin (Hesenpur, 1997: 53). Heya demekê hebûna Kurdan bo îdeolojiya devleta Tirk pirsgirekeke gelek mezin bû. Lê tiştê ku dibû pirsgirêk hebûna Kurdan ya biyolojîk nebû. Tiştê ku pirsgirêk derdixistin holê çand, huner, ziman û hebûna wan ya dîrokî û kevneşopiyêna wan bûn. Yanê nasnameya wan bi sedema çanda wan dibû pirsgirêk. Wextê ku mirov li têgiya nasnameyê dinihêre ev rastî gelek berbiçav in.

Paradigmaya Nasnameyê

Nasname, beriya her tiştî nirxeke mirovahiyê û şarezayê ye. Heya roja iro bi gelek forman derketiye holê. Nasname heyâ sedsala 18 û 19. di her netewan de bi awayên cûr bi cûr derketiye holê. Gund, bajar, ol, kom û hiyerarşiyên civakî, di naveroka xwe de nasnameyan vedîşêre. Nasname bi xwe re du tiştan tîne pê. Yek ji van terîfkirin û nasîn e; yê din jî aîdîbûn e. Terîfkirina mirovan di navbera civakê de bi navekê û bi awayeke civakî nasîn derdikeve holê û hem tişteke însanî ye û hem jî bi tenê taybetmendiyeke mirovan e. Di jîyana ajalan de terîfkirin tenê bi awayeke biyolojîk tê pê (Aydın, 1998: 12). Ji bili şoreşa Fransiyen, bi dû belavbûna bloka Sosyalîst, pêşveçûna netewetiye di qadeke din de bi pêk hat. Ramana Nasnameyan jî bi alîkî girêdayî vê yekê ye. Nasname hem bi awayeke hebûnî û hem jî bi awayeke civakî û hem jî bi awayeke psîkolojiya civakî derdikeve holê. Lê, aliyê nasnameyê ya civakî, di nav van kategorîzasyonan de xala herî girîng e. Ji bo vê jî nasname; avakirina kesayetiyê ya bi civakî ye. Mirov dikare ji vê yeke re bibêje nasnameya kolektif. Wekî Wheelîs (Aydın 1998) jî dibêje, nasname; hîsa yekitî û hevgirtinê ye. Eger ev yek, zirarênek yekitî û hevgirtinê bîne pê, talûke û pirsgirêken civakî

derdikevin holê. An jî mirov dikare bibêje ku, tiştên ku nasnameyê tîne asteke “problem” ne bi tenê kategorîzasyonê wekî sal, zayendî û tiştên din in. Bi xwe sedema van pirsgirêkan, taybetmendiyên şexsî nîn in; sedema pirsgirêkan nasnameyê, aîdibûna şexsan ya bi komekî ve ye. Meseleya Kurd jî wekî tê binav kirin, binpêkirina mafêن yekitî û hevgirtina Kurdan ya nasnameya kolektif e.

Nasname bi pirsên “Ez kî me” û “Em kî ne” ve girêdayi ye. Ji ber ku taybetmendiyêن, kesan ji kesên din ve vediqetîne li ser vê yekê hatiye çêbûn. Yanê di niqaşen nasnameyê de tiştê herî girîng mensûbiyet (girêdan) e.

Pergalên ku xîmê nasnameyê ava dîkin, bi dû şoreşa Fransiyen çend nirxên hevpar bikaranîne. Li gor van nirxan, avakirina netewekî, bi redkirina nirx û têgiyên “din” ve girêdayi ye. Bi dawer û amûrên erkê, ev yek têن zexmkirin. Tiştê ku di vê xalê de ji bo nasnameya Kurdan dibe pirsgirêk, xerîbbûna Kurdan e. Lê pergala Tirk di vê xalê de li ser gelek paradoksan ava bûye. Kurd ji bo monîzma vê sîstemê hem wekî “yên din” hatiye kodkirin hem jî bi mantıqa wê sîstemê “tûne” hatiye pejirandin. Ji bo rewatiya vê jî her dem dîrok hatiye bikaranîn. Pîrozkirina dîrokeke din, dibe sedemê aloziyê û rewşa tevliheviya civakî. Wekî Abbas Valî jî dibêje; karaktera gotina miletperweriyê, ji bo dezenformasyonê gotina neteweyî û bikaranîna gotinê rewakirinê pêwîstiyeye pir mezin e. Ji bo vê yekê jî gotina serdestiyê, pêdiviya têgiyên îdeolojiyê ye (Valî, 2005: 19).

Mirov weke nirxeke civakî ye. Nasname jî cil û bergên mirov yên di nav neteweyan de ye. Nasname hêz û qeweta xwe bi çanda ku aîdbûnê hildigre. Di vê xalê de çand nasnameyê hem xwedî dike, hem jî bi hêz dike. Û mirov dikare bibêje ku çand û nasname hevbendin; ji hev ne bi dûr in. Lê wextê sînorêن civakiyê mezin dîbin, têgiyên nasnameyê jî dicûrin, diguherin û zêde dîbin. Mirov jî bi van guhertinan, ji xwe re nasnameyê emîk dibînin û gelek nasname derdikevin holê. Rewşa van nasnameyê ji bo Kurdan di gelek xalan de bûye sedema pirsgirêkan.

Hîn nasname bi dil û qebûl kirinê mirovan, hîn jî ne bi destê wan in. Mirov bi vê kategorîzasyona nasnamenasînê di navbera leqîniya civakê de ji xwe re cihekê digere û rastiya hebûna xwe dipeytîne. Nasnameya bi hewldanêñ fikrî, bi awayekî tê qebûl kirin, lê nasnameyê wekî bi xwîn û nîjadê ne bi dile mirov û çêtirdîtina mirovan e. Ew yek bi gelek rêgezên zanîstên civakî tê nirxandin lê, tiştê ji bo meseleya kurdan pirsgirêk tîne pê, ev têgiyên gelek têkel, ji aliyê pergala dewleta Kemalist gelek tê bikaranîn. Kurd tenê bi qebûlkirina nasnameya “Tirk” tên pejirandin û bo vê sîstemê bi talûke nayêñ kodkirin. Ev yek li Tirkiyeyê weke polîtikayeke dewletê hatiye programatizekirin û li ser vê yekê jî gelek dezenformasyon têن kirin.

Avakirina Netewe-Dewleta Tirk û Rewşa Kurdan

Sala 1923an di dîroka Kurd û Tirkan de du pêvajoyêن cûda derdixîne holê. Cûdatiya van rewşan ji bo Kurdan, rawestîna jiyan û dîrokê, ji bo Tirkan jî îde-

olojiya dewleta Kemalîst û jiyanekê nûpînû bi xwe re tîne. Wekî her caran tê gotin, du gelên xwedî dîrok û çand, di vê demê şûnda dibin pirsgirêka pergala dewleta Kemalîst. Bi dû kevneşopiya Jon Tirkan û feraseta Îtihat Terakî mefhûmeke amade ji bo afîrînerên dewletê li ber destan bûn. Dewleteke nû ava dibû, mîrata dewleta Osmaniyan ji holê radibû. Ev dewleta ku nû ava dibû, li ser xîmên tekiyê, redkirin û qirqirina çand û gelên cûda bingeha xwe ava dikir. Hîstorîographya Tirk jî bi awayeke nîjadperestî, ne bi şirovekirina mêtî, bi fiksiyona neteweke nû bi pêvajoyeke mîstîfikasyonan saz bûye. Dîroknivîsî hem bi awayeke îdeolojîk hem jî bi awayeke folklorîk tê nivîsîn. Lê wextê dîroknivîsî li ser xîmên polîtîkayê tê pevxistin watedar dibe. Bi taybetî jî dibe sedema meşrukirina programeke polîtîk. Eger dîroknivîsî bi vê çarçoveyê were damezirandin, divê gelek tiştîn rastiyê ji holê rake û programa xwe li şûna vê yekê bi cih bike. Ji bo vê xalê jî pirsgirêka herî mezin, hebûna Kurdan bû. Kurd di wan deman, wekî niha ne xwedan-mekanîzma û pergalekê bûn. Loma jî ev feraseta dewleta Kemalîst, bi şert û mercen Kurdan ve li hev nekir û gelek ser-hildan û pirsgirêk derketin holê. Yanê avakirina pergala nû, cih nedida Kurdan û hebûna Kurdan bi her awayê jiholêrakirin kiribû armanca xwe ya neteweyî. Lê du neteweyen xwediyê dîrok, çand û rastiya jiyanê dê çawa ji hevdu ve-quetiyans û dîrokê çawa ji bo her du neteweyan bi pêş biketiba. Dewleta Tirk bi tenê mafê Kurdan bin pê nekir, wekî din dixwest ku mîrata Kurdan jî holê rake û di vê qadê de valahî û deformasyonekî bîne pê. Ji bo vê jî her derfetêne dewletê gelek bûn. Hiquq, makezagon, siyaset û hêza bi fizik di dest dewletê de bû.

Bî sazkirina dewleta Tirk ya bi bingeha binpêkirin û qedexekirina mafê kurdan, heya roja îroyîn nêzî 90 sal bîhurî. Zimanê kurdan hate qedexekirin. Kurdî beriya avakirina komarê di medrese û avahiyê osmaniyan de dihat bikaranîn, perwerdeya wê dihat dayîn. Û mirov dikare bibêje ku, zimanê Kurdi heya avakirina komarê bi qaşî ziman û wêjeyen netewen hawirdor bi pêş ketibû. Mirov divê li ser bisekine ku ka pergala kemalîzmê bi ci awaye ev yek aniye pê. Tiştî herî girîng jî nerîtandina qedexeyan li avahiyen dewletê, cihe ku gel tê de dijî û qadêni jiyana rojane, li daireyen hikumetê gelek hêsan bûn. Li van deran qedexe kirin gelek baş dihat teqîp kirin. Lê tiştî herî zehmet û di-jwar li gund û warêni bi durî deshilatdariya navendê bû. Li van deran jî hin kesen bi alî dewletê hatibûn erkdarkirin, gund bi gund, bajar bi bajar digeriyan û "cezayê axaftina zimanê kurdî" li wan dibirîn. Wekî Kendal Nezan gotibû, cezayê serê peyvîn bi kurdî 5 quriş bû. Di dema cezayê axaftina kurdî 5 quriş bû, bi xwe mîhek jî 50 quriş bû. Ev cezaya bi herkesi dihat birîn û gundiyan ku ajalêni xwe dianîn navenda bajêr û bi kurdî diaxîfin ceza lê dihat birîn.

Ji bo avakirina dewleta tirk û rastiyen bi wê qewimê re girêdayiye, divê were gotin ku, amûren dewletê ji bo qirkirina ziman û çanda kurdî gelek bûn. Loma zimanê Kurdan jî wekî Kurdan hatibû qedexekirin. Ji bo bingeha vê qedexekirinê were tijekirin jî zimanê Kurdan ji wan re weke zimanekê hovane û paşvemayî hate kodkirin. Armanca vê polîtîkayê jî, seranserî pêkanîna xerîbkirin û "xwefedîkirina" çand û zimanê Kurdan bû. Wekî Emîr Hasanpur jî dibêje,

tundiya sembolîk, ji bo axaftina kurdan hatiye pê. Mantiqa vê yekê jî mirovan bi xwe, çanda xwe, nas, dost û xizmên xwe şerm kirinê esas digre. Ev polîtika bi taybetî jî li ser Kurdan hate nerîtandin. Navê "Kurd" û "Kurdistan"ê hate qedexekirin, û bi dewsa van "Tirkên Ciyayî" û Rojhilat" hate bikaramîn. Bi versiyona nû ya dîroka Tirkan, Tirk wekî herî pêşketî, mîrxas û egîd û zadegan hatin pîrozkirin, û bi gelek nîvisar, pirtûk û axaftinan de Kurd hatin înkarkirin. Di sala 1935an de bi pejirandina "Teoriya Ziman ya Rojé" ve warê Tirkan, Asyaya Navîn weke navenda çand û hunera cîhanê û merivahiyê hate qebûlkirin, zimanê Tirkan jî weke koka hemû zimanan hate diyarkirin. Zimanê Kurdan jî, di ciyayê bêhampa de di bin bandora cîranêñ xwe yên Faris de mane û ji koka xwe -qaşo turan- bi dûr ketin. Ew bi xwe weke êleke Tirkan hatin qebûlkirin.

Hebûna kurdan, bi qedexekirina zimanê wan û tehrîfkirina dîroka wan ve hate pê. Di vê xalê de, balyozê iraqê (1958-64) Talîp Muştak di bîranînen xwe de qala ıdiaya Tirkan ya tunehesibandina gramatîka kurdî dike. Li gor vê polîtikaya dewleta Tirk, di Kurdî de peyvîn beyanî, Kurdî û têkel nêzî 8428 peyvan dike. Li gorî wî;

Tırkıya Berê	3080
Peyvîn Erebî yên di Tirkî de	2000
Zimanê Zend	1240
Farsiya Modern	1030
Pehlewiya Berê	370
Peyvîn Kurdî	300
Zimanê Êrmenan	200
Zimanê Kaldeyan	108
Çerkezî	60
Zimanê Gurciyan	20
Hejmara peyvîn di kurdî de têñ axaftin. (Hesenpur, 1997: 55)	8428

Ev pasaja li ser, feraseta dewleta Tirk ya di derbarê kurdan de, beriya asimîleki-rina Kurdan, kevirê xîmê dewletê û saziyêñ bi wê re girêdayî ye. Ev feraset ji navenda dewletê hate programkirin û hêdî bi hêdî di navbera sazî û avahiyêñ dewletê de belav bû. Ji ber ku tişteke qaşo weha cilêñ "akademî"yê lê hatibekirin, beriya her tişti di navbera sazî û avahiyen de sîrkule dibe.

Îndoktrînasyon û dezenformasyon di qadêñ bûrokratîk, dibistanan û avahiyêñ perwerdehiyê de bi pêş ket. Di vê xalê de tişte herî girîng ew e ku, zimanê Kurdan û rastiya Kurdan ya biyolojîk, weke "hovane", "qirêj" û "xerab" hate dîtin. Kurd bi xwe jî di derbarê xwe de weha fikiîn. Zimanê xwe wekî zimanê qirêj dîtin. Derfetêñ pergâlê yên wekî, perwerdehî, çapemenî, avahiyêñ bûrokrasiyê ew yek dipeyitand. Di ferhenga The Oxford Turkish-English Dictionary'ê ya di sala 1986'an, çapa sêyemîn de, di derbarê Kurdan de weha dînivîse: "bi awayeke etnîk, Kurd; (biçûk dîtî) kesên hovane"(1997: 55).

Kurd di şixulandina vê makîneya dewletê de her dem, hem bi awayeke polîtik û hem jî bi awayeke jîyanî biçûk hatin ditîn. Ji bo vê jî gelek derfet hebûn. Çapemenî, perwerdehî... Ev ji bo bi cihbûna mantiqa monîzma dewleta Kemalist pêwîst bû. Ew yek di dema destpêka avakirina dewletê heyâ roja îroyîn her dem dewam kir. Akademiyêن Tirkîyeyê di vê hêlê de ji bo "hilberîna derewan" bareke giran wergirtin li ser milên xwe. Uniteyên hatibûn erk-darkirin, binasiyê hebûna xwe, li ser tunekirin, "Tirkbûna Kurdan" kifş kiribûn. Mamoste Îsmâîl Beşîkçî ji vê yekê re dibêje "zanîsta sîparîş." Mirov ga-va ku di dîroka nêz ya Tirkîyeyê dinihêre, gelek tiştên vê yekê dirastîne hene. Amûren dewletê ne bi zanîngeh bûn. Wekî tundiya sembolîk hatiye bi-navkirin, Kurd û tiştên bi Kurdevariyyê re girêdayîne ji bo meşrûiyeta xwe, bin-pêkirina hîquqê ji bi xwe anîn. An jî mirov dikare bibêje ku hîquq jî bo vê yekê hatibû avakirin û ev tişt ji bo hîquqê tişteke gelek asayî bû. Rektoriya Zanîngeha Mersînê, di 21 sibatê de, bi sedema "Roja Zimanê Kurdan" ji 35 xwendekarênu ku çalakî kiribûn re gelek ceza birîn. Di agahdarnameya cezaya dîsîplînê ku hatibû birîn de, zimanê Kurdan bi awayeke "qestî mestî"^{*} hatibû terîfîkirin. Yek jî di agahdarnameyê de tîpa yekemîn ya peyva Kurdî û Kurdan bi tipêñ hûr ve hatibû nivîsin. Ev yek ji aliyê rektorê Zanîngeha Mersînê, Suha Aydin ve hatibû nivîsandin.

Qedexekirina Zimanê Kurdi

Di van rojêñ dawîn de wekî tê niqaşkirin, pirsgirêka meselaya Kurdan ya esasî tunekirin û pişavtina çand û zimanê wan bû. Wextê mirov li bingeha vê yekê dînihêre, mirov ber bi dema Osmaniyan ve diçe. Cara yekem, di sala 1910'an de navê gund û warêñ bi Kurdî hatibû qedexirin. Bi dû rewşa Osmaniyan ya xerab de, polîtikayêñ ku bo xelaskirina Osmaniyan cûr bi cûr derketin holê. Di dawiya hilweşandina Osmaniyan de, bi avakirina komara Tirkîyeyê jî navê war û gundan hate qedexirin. Bi du serhildana Şêx Seîd, di sala 1925, ya serhildana Dêrsimê 1936-38, 40-49, û wekî din bi dû derbeya Tirkîyeyê ya leşkerî, di sala 1960an û 1980an de navê Kurd, warêñ netirkî hatin qedexirin.

Bi dû qedexirina navê warêñ kurdan, di sala 1916an de û wextê ku dewleta Osmaniyan ji holê radibe û komara Tirkîyeyê ava dibe. 10ê Berfenbarê, sala 1920an ev zagona ku qedexekirina navêñ ne bi tirkî, dîsa tîne meclîsê û di sala 1922an de navê gund bajar, ciya û gelek navçeyan tê guhertin.

Di sala 1934an şûnda guhertina navan gelek zêde bûn. Salêñ komarê yên pêşîn bi ser vî esasî hatibû ava kirin. Di vê navberê de yanê di navbera salêñ 1934-36an de 837 nav di bajarêñ kurdan de hatin tirkîkirin. Navêñ Erebî, Lazkî, zimanê Gurcî û Ermenan jî bi dû re

hatin qedexirin. Di sala 1957'an de "Komîsyona Pisporî ya Guhertina Navan" hatiye ava kirin.

* qestî mestî, di jiyana tirkîyeyê de ji bo tiştên ku dijî dîroka fermî tê gotin û wekî 'sozde" tê bikaranîn.

Her çiqas dewlet bi wan saziyan pêk were ji, di vê komîsyonê de gelek avahiyên dewleta yekane, ya neheqiya dewletê hevpar bike û wan bi awayeke zanistî bide xuyan û meşru bike hebûn. Ew sazî ev in: Wezerata Karêñ Hindur, Serfermandarî, Wezerata Perwerdehiya Neteweyî, Fakulteya Ziman û Dîrok û Erdnîgariyê ya Enqereyê û Saziya Zimanê Tirkî. Di hilbijartinan de hikumet parlemento her dem guherî û ev avahî her dem peywira xwe anîn cih û heyâ sala 1978'an nêzî 28 hezar nav û war guhertin û ew kirin Tirkî. Di nav van de nêzî 13 hezaran navê gundan hebû, yên din ji zêdetirîn çiya, banî, çem û robar bûn. Bajarêñ kurdan de rewşa guhertina navê gundan weha ye:

Agirî	374
Qers	398
Çewlîk	247
Bilîs	236
Mûş	297
Wan	415
Diyarbekir	555
Semsûr	224
Riha	389
Colemêrg	128
Mêrdîn	647
Erzerom	653
Erzingan	366
Sêwas	406
Dêrsim	273
Xerpêt	383
Meletî	217
Mereş	105
Sêrt	392
Dîlok	279 (Boran, 2009)

Wekî li ser hatiye nîşankirin, bi dû xebatên vê komîsyona ku navêñ war, çem, bajar, navçe û gundan diguhurtin, di dema derbeya leşkerî ya 1980an ji ev guhertin zêdetir bûn.

Li ser qedexekirina zimanê Kurdi, mirov dikare bibêje ku, pergala Kemalîst, bi van nêrîtandinê şideta (tundiya) sembolîk, armanc kiriye ku têkiliya Kurdan û dîrok û mêjuya wan bide qutkirin. Ev nêrîtandinê sembolîk, bi amûrêñ dewletê û derfetêñ pergalê, herdem hatine destekkirin, hiquqê ji ev pratîk gelek piştar kirine.

Di van rojêñ dawîn de li gor rojêñ berê û dema avakirina komarê, normalizasyona zimanê Kurdi hêdî bi hêdî pêk tê. Lê ji bo her zimanekî pêşveçûn û standardizasyon çawa be, divê bo zimanê Kurdi ji wisa be. Qirêj û gemariya qedexeyêñ dewletê, helbet gelek deformasyon û pirsgirêkên mezin derxistin holê. Lê

piştî meseleya Kurdan û pirsgirêka zimên, divê standardizasyona zimanekî çawa tê pê û cudatiyên zimên çawa ji holê radibin, niqaşen wan werin kirin.

Di Plana Îlehatê ya Şerqê de bingeha qedexekirina zimanê kurdî, rê û rêgezêن wî hatine tespit kirin. Di vê Îlehetê de asimilekirina Kurdan û gelên din hatine armanckirin û li ser çand û huneran wan îpotek hatiye danîn. Îsmet paşa bi xwe li ser vê pêvajoyê disekine û rast bi rast li ser asîmilekirina Kurdan disekine. Mistefa Kemal di derbarê wî û rapora Îsmet Paşa, rapora ku hebûna Kurdan qedexe dike, çand û hunera wan ji holê radike de weha dibêje: "em rasterast milletperwer in û nîjadperestê Tirkan in, mesnata komara me Tirk in. Efradêن vê civatê, çiqas bi çanda Tirkan werin meşbûkirin, ew ciwat jî ew qas bi hêz û quwet dibin" (Bayrak, 2002: 19).

Pêşketin û pêşveçûna zimanekî rasterast bi mekanîzmeyekî ve girêdayi ye. Ev mekanîzma jixwe xebatêن li ser zimên dike, cûdatiyan ji holê radike û zimên di qada dadî, idarî, tenduristî, civakî dixe zimanê sereke, jiyanê, dinamîkên guhertinê û dînyayê bi wê awayê werdigerîne wî zimanî. Ev mekanîzma, di şert û mercêن sedsala zoan de tê wateya dewletê. Encax bi derfetêن dewletekî, bi amûrêن pergala dewletekî zimanek bi pêş dikeve. Çimku ziman ne bi tenê bûyereke axaftinê, an jî meseleyeke komunîkasyonê ye. Ziman hewce dibîne ku xwe, di qada wêjeyê, civakêن zanistî, teknolojiyê hunerê û gelek qadan de sistema xwe çêbike, jargona xwe pêk bîne. Ji bo zimanekî yekgirtî, zimanekî pêşketî û divê riyên li ber zimên werin rakirin. Ziman encax bi derfetêن dewletekî xwe bi pêş dixîne. Çimku ziman bi xwe, li gor feraset û mantîqa xwe tişteke sistematîk e. Gel û neteweke çawa cûda û veqetandî be, ziman jî wê şiklî hildigre. Encak îmkanên dewletekî, ziman û çanda wî miletî sistematîk dike.

Di sala 1950an de gef û zordestiyêن li ser zimên hinek têن sivik kirin. Di wê demê pirtûk, kovar û hîn weşanêن Kurdî bi awayeke nîvserbest tê çapkiran. Lê mixabin ew yek heta derbeya leşkerî ya 1980an dewam dike û piştî derbeyê dîsa ziman tê qedexekirin. Sala 1991an de çend kovarêن bi Kurdî hatin weşandin, lê ew yek di nav heman Kurdan de deng veneda, û bi dû vê nerîtandinê jî ziman dîsa hate qedexekirin. "Li Rojhilata Navîn gelê ku hemû mil û beşen wî jî perwerdehiyê mehrûm in, bi tenê Kurd in. Sedem, ne standarbûna zimanê wan e, zêdetirîn jî gef û zordariyêن li ser zimên in. Ji alî Kurd û yên ne Kurd in ve gelek peyan hatin kirin û ew dîsa bêencam ma. Ji xwe li Tirkîyeyê sedema destpêka şer û peşveçûnan bi van nêritandinê şideta sembolîk ve hatiye pê û şer jî ew yek neguherand (Izady, 2004: 315).

Bandorêن Zimankujî û Çandkujiyê

Bandorêن qedexekirina çand û zimanê Kurdan, di jiyana kurdan de veşarti ye. Perçebûna Kurdan, qedexekirina zimanê wan ve mimkun e. Ji bo vê jî di dîroke 90 salî de gelek pirsgirêkên mezin derketin holê. Kurd ji warê bav û kalêن xwe hatin veqetandin, gelên din dewsa wan hatin bi cihkirin. Kurd hatin asimilekirin û gelek texribatêن çanda wan derketin holê. Dewletê bi mudaxileyê tund, Kurd çavtirsî kirin. Kurdan loma nasnameya xwe veşart. Kurden xwendî an jî "elît" bi zimanêن din dinya fêm kir, û gelek kesan jî xebatêن li ser

Kurdan bi zimanê din kirin.

Niha jî di dest me de di xebata Emîr Hesenpûr (1997) de lêkolîneke di derbarê vê mîjarê heye. Di vê besê de mirov dikare li ser wê bisekine. Ev lêkolîn, bi qedexekirina zimanê Kurdî ve pêşveçûna axaftina ziman çawa hatiye pê û di derbarê wê demê de hin raman û fikran dide mirovan. Li Kurdistanê niha hin cih zêdetir û zûtir ji çand û zimanê Kurdî bi dûr ketine. Hin kes dê û bavêwan bi Kurdî qise dikin lê ew bi Kurdî nizanin. Di wê nivîsê de;

Hejmara veguhertina kesên ku bi Kurdî dipeyvin (bi awayeke hezar kesî):

Kesên ku Kurdî Dipeyivin:	1945	1955	1960	1965
Zimanê Zikmakî:	1.477	1.680	1.848	1.430
Zimanê Duyemîn:	?	681	712	940
Komînek (yekom)	1477	2.361	2.560	2370

Di sala 1965an de daketineke gelek mezin çêdibe. Nêzî %23 yan e ev. Lê wextê ku mirov difikire, ji bo vê yekê divê nifşeye nû were, lê tişteke wisa tune û ew bi her awayê bi hêza pişavtinê ve girêdayî ye. Weke din mirov dikare bibêje ku ev yek bi zordestî û bi gefen dewletê ve têkildar e. Ji sala 1955an heta 1960an nêzî %10 kesên ku bi zimanê neteweyî dipeyivin zêde dibin. Ev yek jî bi kêmasiya gef û zordestiyêne dewletê re girêdayî ye. Di hejmara kesên ku bi Kurdî dipeyivin bi awayeke Zimanê Duyemîn dipeyivin, her dem zêde dibin (? 681, 712, 940). Ev yek serketina pişavtinê û tirkkirinê nîşan dide. Çimku Tirk zimanê Kurdan hîn nebûn û ew yek, tê wateya kesên ku hîn Kurdîtiya xwe wenda nekirine û Kurdênu bûne Tirk, dide diyar kirin.

Tirkkirin wextê bi zorê tê kirin ew bi xwe re berxwedanê tîne. Li gor hin çavkaniyêne dewletê, tirkkirin bi awayeke hêdî hatiye pê, û gilî û gazin hatine zimên. Ji bo vê mînakek di destê me de ye. Di rojnameya Cumhuriyetê, sala 1966an û meha Tirmehê de mebûseke Tirk weha dibêje; "Li Mêrdînê xelk ji %91 bi peyvekî jî Tirkî qise nakin. Li bajarênu Kurdan yê din de jî rewş weha ye: Sêrt%87, Colemêrg %81 Diyarbekir %67 Çewlik %68 û Bilîs %66 in.

Zimanê Kurdan li Tirkîye hin nehatiye tunekirin. Lê kesên desthilatdar hin bi tunekirina zimên bawer in. Tunebûna zimanekî bi awayeke filolojîk pêk nayê. Li her alî cihanê ev yek qet wisa nehatiye pê. Di nav politikayêne Tirkîye de îmhakirina gelekî bi tune kirin û qedexekirina ziman û çanda wan ve mimkun e. Rejîma Cumhuriyetê, gelheya Kurdan ci qas zêde be jî her dem bi dû vê yekê ketiye. Her ci qas Turgut Ozal di sala 1991an de qedexeya axaftina bi zimanê Kurdî rake jî, di politikayêne dewletê de tu ferqe çenebûne. Ev politika, ji xwe politikayeke taktîk e. Pergala Kemalist bi krîza ekonomîk, siyasî, çandî û ideolojîk ve tarûmar bibe jî ji van politikayan dest nekêşandiye (Hesenpur, 1997: 60).

Qedexekirina zimên bandora xwe herî zêde li ser standarbûna zimanê kurdî dihêle. Zimanek, ji bilî di nav gel û jiyana rojane, di her qadênu jiyanê de divê were axaftin. Wextê ku Kurdî jî nehat axaftin, cûdatiyêne zimên zêdetir der-

ketin holê. Zimanek di beşên dadî, tenduristî, ïdarî û civakî de neyê axaftin, ew ziman di qadeke biçük de dimîne. Pêşveçûna wî zimanê ne bi tenê girêdayî axaftinê ye. Divê ziman bibe zimanê jiyanê. Huner, wêje, civakên zanistî divê bi wî zimanê werin kirin. Divê ziman di sazî avahiyên mekanîzmeyekî de were axaftin. Divê zanîngehêن wî zimanî hebin, ew ziman di wan zanîngehan de di makîneyê re derbas bibe û beşên zimên werin çêkirin. Dîroka komara Tirkiyeyê, bi pêsigirtina vê yekê, bi qedexekirina zimanan, kujeriya çandan û talankirina dewlemendiyê ve tije ye. Qedexekirina zimanekî bi tenê pirsgirêkên ragihandinê dernaxe pêş. Kesên ku di nav du nîv-zimanan de xitimîne û gelek pirsgirêkên civakî û psîkolojîk derdixîne holê. Di sûc, pirsgirêkên civakî, problemên şexsî, xerîbbûn, cînayet û gelek tişt bi vê rastiyê ve eleqed-er in.

Gava ku mirov dîrokê dînihêre, encamên politikayêن dewleta Tirk bi gelek amûran pergalê encam dide û pergal di gelek qadan de digihêje mirazê dile xwe. Di serî de plan û programa her tiştî hatiye kirin, rê û rîgezêن her tiştî jî hatiye kifşkirin. Di Plana Îslehêtê ya Şerqê de bendên 9 û 12 di derbarê her tiştê de gelek fikiran dide mirov. Ji bo çandeke xwerû, hemû nirxên miletan, huner û çanda gelan hate texrîbkirin. Berhemên gelan yên bi hezaran salan di gelek dema kurt de hate veguhertin. Ji bo vê jî derfeta dewletê û saziyên wê gelek bûn. Dewletê ev politikayêن xwe di beriya her tiştî, li zanîngehan qaşo weke zanistî da nîşankirin, bingeha wê bi "hilberîna derewan" çêkir. Asîmilasyon li dibistan, enstîtu, zanîngeh, avahiyên bûrokrasiyê, nexweşxane, girtîxane û gelek cihêن mirov mecbûr in ku têkildar bibin û kar û barê xwe kuta bikin de çêbû. Ev tunekirina organizasyonel di roja me de jî hin ji aliyê dewletê û çapemenyê nayêni niqaşkirin. Bi van politikayêن dewletê Kurd gelek meddur bûn. Hin kes ji neçariyê koçî derî welêt bûn, hin kes jî bi salan di zindanan de man. Kurd hem ji zimanê xwe yê zîkmakî merhum man, hem jî divê bi zimanake xerîb dinya fêm bikirana. Kurdan bi zimanê biyanî, zimanê xwe yê zîkmakî pişavt. Lê divê mirov ji bo fêmkirina vê yekê li benda Plana Îslehêtê ya Şerqê binihêre. Benda 9. weha dibêje: "bo pardayîn û payedayîna tirkbûnê û Tirkîyê, bi tenê safbûna tirkbûn û Tirkîyê û rûmetdarbûnê nîne. Ew ji aliyê daringî ve jî nîşan dide ku ew netewe di karê de ye." Benda 12: "divê neyê ji bîrkirin ku, cil û berg, kilam û stran, lîstik û govend, dawet û dîlan, edet, tore û kevneşopiyêن miletékî, her dem hîs, hiş û aqilê wê mileti hişyar dihêle. Ew tiştan, wê neteweyê bi pêşeroja wê milete ve girê dide û bîr û baweriya wan herdem bi hêz dike. Her weha, divê ji bilî zaraveyan, va kevneşopî û edetê netewan yên dijraber divê bizirar û û xerab were nîşandan. Yanê divê ziman û edetê wan were tirk û tirkîkirin. Ev yek peywira herî mezin û girîng e."

Wekî li jor jî tê gotin bandora qedexe û zordestiyan di her aliyê jiyanê de hatiye pê. Ji bo civaka homojen, divê tekaneya çandan, yekaneyâ zimên çêbibe. Bandora vê yekê zêdetirîn xwe li ser xîmê nirxên zimên û çandê derxistiye. Dewleta Tirk tiştê ku karibûye pişavtîne çêkiriye, yên din jî bi medyayê, bi wezereta perwerdehiya neteweyî û hiquqê deformî kiriye. Tiştê ku quweta wê negihiştiye jî bi "xwe û çanda xwe şerm kirinê" çêkiriya û wisa gihiştiyê mi-

raza dilê xwe.

Tışteke din jî, ya bi nerîtandin, polîтика û daxwazên pergala Kemalist ve girêdayi ye guhertin û texrîbkirina çanda Kurdan e. Wextê ku mirov li muzîka Tirkî dinihêre gelek tişt tên dîtin. Bi dû avakirina komarê, her tişti hêdî bi hêdî xwe nîşan kir, hemû kevneşopiyê Kurdan û gelên din, bi amûr û saziyêne dewletê ve şikl û sûretên xwe guherandin. Klam û stranên Kurdan, bi awahiya TRT û qedexebûna zimên, xwe wergerande Tirkî. Ew jî wekî Rapora Plana Îslehatê ya Şerqê pêk hat. Di nav van veguherinan de yan gotinê klam û stranan, yan jî melodiyê wan bi awayek texrîb derxete pêş. "Wextê klam û stranên Kurdi tên tirkîkirin, bi taybetî gotinên wan tên guhertin. Car caran îstîsnayê van jî hene. Mînak, hunermendê Wanî Atakan Çelik, strana 'Gulê rabe sibe ye' wekî sadiqê rastiya stranê dimîne û bi awayeke Gulê uyan sabahîr" dibêje" (Korkmaz, 2002: 43). Dîsa di nivîsa Mehmet Bayrak de weha tê gotin: "İbrahim Tatlıses, ji bo guhertina gotinên klam û stranên Kurdan dibêje ku 'lihevnekirina zimên.' Mînak Ayaxında Kundura... li hev nake. Çima? Ji ber ku di klam û stranan de berfirehbûn û navber heye. Peyvîn Kurdi heya astekî hil tên, wextê ku mirov wan werdigerîne Tirkî, ne hevdengê wan ne jî pîvana wan li hev dîkin. Yanî mirov ji neçariyê werdigerîne. Yanê eger wergera bi Tirkî lê bike, hunermendê jî wisa bikar bîne. Lê li hev nake"(2002: 44).

Kurdî, Pirçandî, Pirzimanî û Çend Perspektif

Mijarêni siyasetê û rewşa ziman û çand, bi hev re girêdayi ye û encamên wan cûda bi cûda pêvajoyan derdixîne holê. Di van pêvajoyan de tişte ku bi awayeke rastiya mijarê nayê niqaşkirin, dibe sedemên dezenformasyonan û gelek çewtiyêne mezin derdixîne holê. Li Tirkîyê ji aliyê meseleya Kurd de, pirsgirêka zimên, di nav niqaşan de meseleye herî dominant e. Ji ber ku siyaset, daxwazên polîtîk, ideolojî li gor dem û dewranan digihurin. Konjonktur her dem li gor rastiya xwe û demê, rewş û rûyê pirsgirêkan cûda bi cûda dike. Lê; ziman her dem rastiya xwe û ya jiyanê vedişêre û destûrê nade tu siyaset û politikayê guhîrbar. Pirsgirêka zimanê Kurdi gelek caran li ser meseleya siyaseta Kurd e. Her wiha, wek gelek kes jî tînin zimên, rastiya meseleya Kurdi, her ku diçe zêdetir dibe. Her çiqas zimanê Kurdi her ku diçe ji aliyê standartîzasyonê, an jî qedexe û tundiyêne wekî berê tune be jî, gavêne mezin diavêje. Ziman wekî berê qedexe nîne, lê ew yek bi tenê têra bi pêşxistîna zimên nake. Siyaseta dewleta Tirk her dem xwestiye ku zimanê Kurd tune bike û bo vê jî ew qedexe kiriye. Wextê ku ziman qedexe bû û ji gelek derfetan bêpar ma, wê di naveroka zimên de jî bandora xwe nîşan da. Di derbare qedexekirina ziman û çanda kurdan de, li ser gelek tişt hatin gotin. Heyanî avakirina dewleta Tirk, zimanê Kurdi di medreseyan û nav gel de dihat axaftin. Vê yekê ziman bi awayeke zindî diparast û naveroka ziman û çand jî gelek berfireh bû. Ji bo pêkaninê monîzma pergala Kemalist, divê yan Kurd, yan jî zimanê wanbihata tunekirin.

Meseleya zimanê Kurd, gelek caran pêşveçûn û rewşa siyasetê dixitimîne. Neteweyek zêdetirîn bi zimanê xwe dikare bibe perçekî çand û kultura

gerdûnî. Ev yek di tevger û hereketa kurd de jî di van demêن dawîn de gelek tê ferqkirin. Bi avakirina komarê ve ziman di saziyan de, di avahiyêن dewletê, yên dadî, bûrokrasî, tenduristî û civakî de nehatiye axaftin. Wekî din zimanê Kurdî tu caran nebûye zimanê perwerdehiyê. Di warê ragihandinê, çapkiran û weşanê de jî dîroka wê zêde bi dûr nîne. Kurdan her dem bi derfetêن xwe yên biçûk, gefxwerin, zindan, ceza û gelek caran jî jiyanâ xwe xistine xetereyê û bi bêîmkaniya xwe xwedî zimanê xwe derketine. Lê meseleya zimanê Kurdî dîsa jî ji holê ranabe. Di tam vê halê de zaraveya Soranî, ji bo fêmkirina rewşa ziman, mînakeke girîng e. Her çiqas derfetêن zaraveyê Soranî seransefî bes nebe jî, dîsa Soranî di nav zaraveyan de herî zêde pêşketi ye. Sedema vê yekê helbet, encamên hereqeta başûr e. Lê divê mirov bi awayeke zelal bîne zimên ku, serbestiya zimên pêşketina zimên tîne pê. Serbestiya zimên, serbestiya netewî ye. Zimanek encax di destpêkê de bi perwerdehiya zimanê zikmakî tê parastin. Lê ji bo zimanekî bi tenê parastin nehewce ye. Zimanek pêdivî dibîne ku, di kategoriyeñ jiyanê de bi pêş bikeve. Zimanê hevotinê, bi têra pêşketinê nake. Divê di avahî û saziyan, çapemenî û zanîngehan de ziman were bikaranîn, bi ziman nivîsin û xwendin were teşvîkkirin. Divê ziman bibe zimanê wêje û hunerê. Divê raçavkirina dinyayê, teqîpkirina pêşketinê teknolojiyê bi zimên werin kirin. Divê herî zêde jî bazara zimên hebe, ziman bibe zimanê meaşê.

Bi dû salêن 9oî pê ve, li Tirkîyeyê niqaşen pirçandî û pirzimanî her çiqas kêm be jî têن kirin. Meseleya zimanê Kurdî jî, di nav van niqaşan de zêdetirîn tê kirin. Lê divê di vê pêvajoyê de bi awayeke baldarî rewşa zimanê Kurd û kore-lasyona pirzimanî were kirin. Pirzimanî bi derfetêن dewleta raser, zimanên din dixe di bin bandora xwe. Weke tê zanîn jî, Kurdistan, Anatoliya û Mezopotamya di destpêka dîrokê heyânî iro, bûye çavkaniya ziman û çandên cûda. Di her zimanê hîn dijîn de jî dews û rêça çand û zimanên wendayî veşartti ne. Zimanek rewşa Kurdî, divê ne bi cîgirê zimanê sereke ya Tirkî be. Divê ziman xweserî xwe û bi îmkanên dewletekî were parastin. Bi nêrînên pirzimaniyê weke parastina nirxeke dîrokî nebe. Divê meseleya zimanê Kurdî di nav van niqaşan de gelek cih bigire û divê çareseriya pirsgirêka ziman bi awayeke "parastinê" jî na, "bi pêşxistinê" were kirin. Ji ber ku Kurdan bi îmkanên xwe zimanê xwe perestiye. Tiştên ku iro şûn ve were kirin pêşxistina zimên e. Pirçandî û pirzimanî ji bo neteweyên pêşketî tê niqaşkirin. Ji bo Elmanyayê parastina zimanê Tirkî û perwerdehiya wî zimanî fena rewşa zimanê Kurdî nîne. Yek jî rastiyêن civaka Tirkîyeyê û Kurdan fena netewên Ewropî jî nîne.

Polîtikayê Çand û Ziman û Çend Nirxên Li Ser Dengbêjiyê

Di destpêka vê nivîsê heyânî dawiyê, li ser polîtikayên dewleta Tirk hate rawestan, bi avakirina komara Tirkîyeyê heyânî roja iro polîtikayên dewletê yên çand, ziman û nasnameyê hate nirxandin. Di nav polîtikayan de jenosîta ziman, çand û nirxên miletan, bi taybetî jî Kurdan hate nirxandin. Di vê beşa dawîn de jî, têgiya ku ji bo ziman, çand, edet û folklorâ Kurdan gelek girîng e û gelek barêن dîrokê daye li ser milêن xwe dê were niqaş kirin. Dengbêji di nav van niqaşan de, ji aliyê rewşenbîrên Kurd û Tirk, heya roja iroyîn qet nehatiye axaftin.

Klam û stranên gelekî mêtî û hişê wî gelî ye. Ew klam, stran û çîrokê gel, ele-qeya wî gelî û dîrokê çêdike û her dem wî gelî li ser piyan dihêle. Dengbêjî di vê mijarê de peywîreke herî giran û mezin daya li ser milê xwe. Bi avakirina dewleta Tirk ya netewî, beriya her tiştî zirar dida berhem û dinyaya Kurdan, ya nivîskî. Kurd her çiqas, ji îmkanêni nivisê mehrum bibana jî, çanda wan ya devkî gelek zindî bû. Di pêvajoyê de politîkayê dewletê tundtir bûn û çanda dengbêjiyê jî hêdî bi hêdî ber bi paşveçûnê ve çû. Sedemên vê yekê hem politîkayê dewletê ne, hem jî derketin, belavbûn û pertbûna televîzyonê, radyoyê ye. Yan jî mirov dikare bibêje ku ev çîrokbej, hunermend û per-birsyarêni dîrokê yên pîroz bi pêşketina dîtbariyê erka xwe temam kirin. Her çiqas vê gavê dengbêj bi awayeke “erka xwe temam kirin” werin kodkirin jî, bi tevdîr û politîkayê parastinê, belkî jî dikaribûn bihatibana mihafezekirin.

“Nivîs” bi awayeke sistematîk seranserî bi pergala mekanîzmeyekî ve girêdayî ye. Dewletek encax nîzama nivîsê pêk tîne. Dengbêjî di vê xalê de êş û jana bêpergalbûnê, tengasiyêni sistemekî de derdikeye pêş. Di dema arkaik heyânî iro jiyana Kurdan, dewlemendiya çandê, renginya zimên, estetîka Kurdan bi xwe re kaş kiriye û heyânî iro anije. Ser û pevçûnêni Kurdan, yên bi hev re û dewleten serdest, têkiliya gel û di hiyerarşıya civakê de axa û şêxan nîşanî mirov dike. Di serhildanêni Kurdan de têkiliya mîran û gel çekiriya û di navbera wan de wekî pirekî erkdar bûne. Eleqeya gel û ya hêzên serdest bi gotin û vegotinêni wan ve çêbûye. Ev yek tê wateya ku, dengbêj bi tenê “deng” an jî “bêj” nîne. Bi awayeke sosyolojîk, di tebeqeyêni civakê de gelek rastiyan vedîşerîn. Gund bi gund, bajar bi bajar digerin û hêza gotinê belavî her aliye cihanê dîkin. Wekî tê zanîn bi şert û mercen dîrokî siyasî, di jiyana Kurdan de “nivîs” zêde bi cih nagire. Tiştên ku pêdiviya nivîsê dibîne, domandina xwe bi ser dengbêjan de bi cih anije.

Wekî Walter Benjamîn jî tîne zimên, “di dema şer de hemû dengbêj, çîrokbej, aşiq û hozan ji mehderê radibin û tu kes di ortê de nayê xuyan. Ji ber ku eger li cihekî şer hebe, deng tune ye.” Belê her çiqas “deng” car caran şer û cengan ji holê radike jî, di dîroka Tirkiyeyê de tiştên dijî vê yekê hatiye pê. Wekî Benjamîn tîne zimên, cihê ceng û pevçûn çêdibe, mafê axaftinê namîne. Tiştên ku diaxîfin bi tenê çek in. Dema ku mirov ji avakirina dewleta Tirk heyânî iro dînihêre her dem nîrîtandinêni qedexekirina zimanê Kurdi, talankirina çand û hunera gelên cûda li ber çavan in. Hem bi nîrîtandinêni siyasî, politîk û huquqî hem jî bi çek û sîlahêni dewletêjenosîta vê çandê jî wisa çêbûye. Di nav van politîkayen de, bandora herî zêde li ser dengbêjan bûye. Di jiyana Kurdan ya pastoral de, têkiliya gel û xwezayê û jiyana çoltêriyê bi aliye dengbêjan estetîze bûye û heya iro hatiye. Wexte ku gund hatin valakirin, di jiyana Kurdan de jî gelek tişt guhurîn. Wekî tê zanîn dengbêj hunerên xwe li gundan, di dîvanx-aneyen de îcra dîkin. Berê gund hebûn û bi dû şewitandina gundan, şiklê jiyana civakî guhurî û bandora vê yekê li ser dengbêjan jî çebûn.

Serê ku di navbera PKK û dewleta Tirk qewimî de gelek zirarêni mezin li ser dengbêjan çêdibe. Ji bilî politîkaya dewletê ya bi avakirina komarê, salêni goî jî di jiyana çand û hunera Kurdan de pirsgirêkêni mezin derdikeyin holê. Wexte

ku bi nêzî 5 hezar gund -hejmara vê guhêrbar e- têñ valakirin û şewitandin, dezgehêñ hunera dengbêjan jî ji holê radibe. Hem şewitandina gundan hem jî qedexekirina ziman, dengbêj di qadeke mîkro de ma û ber bi paşveçûnê ve çû. Bi pêşketina dîtbâriyê jî dengbêjan derbeyeka mezin hilda. Dengbêj bi şerê PKK û dewleta Tirk ve nikaribûn debara xwe jî bikin û di nav feqîrî û xizaniyê de ji jiyana xwe dest dan. Wextê berê, dengbêj li cem şêx û melayan, axa û mîran bûn. Dengbêjê her eşîr û mîrên Kurdan hebûn. Wana bi berdêla gotinan bexşışêñ mezin hildigirtin û halê kêtêwan pir di cih de bû. Wextê ku komar ava dibe kargeriya herêmî û ya navendî de paradoks û handîkapêñ mezin derdiKevin holê. Hêzeke dengbêjan biparêze namîne, û ew bi pirsgirêkêñ mezin re rû bi rû dimînin.

Di dawiyê de, li ser çanda dengbêjiyê û pirsgirêka jenosîta ziman, çand û hunerê seranserî bi polîtikayêñ dewletê yên avakirina komarê û netewe-dewletê ve girêdayiye. Deformebûna çanda dengbêjiyê, bi qewimîne şer ve ber bi paşveçûnê ve çû. Naveroka wan jî zêde nebû di nav van şert û mercan de. Her ku çûn hatin pişavtin, her ku çû xêwa gelekî hate texrîbkirin. Ji îro pê ve belkî vegerînêñ nemimkun hene lê, ji bo fêmkirina qirkirina dewletê ya Kurdan, serhildanêñ Kurdan û naveroka wan, têkiliya gelê Kurd û axa û mîran di hindurê wan de veşartî ye. Ji bo dîrok nivîsîna Kurdan gencîneyêñ gelek mezin in. Bi avakirina mekanîzmeyekî, ji bo çand û huner û zimanê Kurdan çavkaniyêñ gelek kérhatî ne. Bi xebatêñ akademîk ve ji bo fêmkirina dîroka Kurd jî gelek girîng in. Wekî din ji bo kesen ku dixwazin li ser zimanê Kurdi bixebeitin jî çavkaniyêñ pir muhim in. Û herî zêde jî wekî "Trabedour"êñ Fransiyân jî, bo derbasbûna wêjeya nivîskî gelek tiştên girîng wedişêrin.

Encam

Kurd bi hezaran sal in, li welatê xwe dijîn. Heyanî sedsala zoan, wekî gelên din çand, huner, wêje û zimanê wan dewlemend bû. Bi dû sedsalâzoan, bi şerê parvekirina emperialist hemû nirxên wan ên dîrokî, çandî zimanî derbeyêñ gelek mezin xwarin. Di vê nivîsê de jî polîtika dewleta Tirkîyeyê ya li ser ziman, çand, huner, wêje, nasname û mafêñ mirovan hate sekinîn. Tiştên qewimîne û texrîbatêñ wan, ji bo fêmkirina pêşerojê pir girîng in. Wekî din jî mirov dikare bibêje ku, bîr û xêwa Kurdan, bi wan polîtikayan hate tunekirin. Lê êdî dem û pêvajo ji bo Kurdan bi awayeke din dişuxile. Kurd her çiqas dereng man in jî, êdî xwedan ceribandinêñ mezin in. Tiştên ku di dîrokê de qewimine nîşana vê yekê ye. Bi sîstemeke xweser, bi mekanîzmeyekê serbest, wek gelên rojhilata navîn an jî netewêñ din, ji bo Kurdan gelek pêşketinêñ dê derbiKevin pêş.

Çavkanî

Polîtikayê Dewleta Tirk Ya Çandkuji û Zimankujya Kund û Dengbêj

- Aydin, S. 1998. *Kimlik Sorunu, Ulusallık ve Türk Kimliği*. Ankara: Öteki
- Boran, Sidar. 2009. *Norşin ve Kürtçe isimler 99 yıldır yasak*. 2 Eylül 2009.
<http://www.firatnews.org/index.php?rupel=nuce&nuceID=12438>
- Bayrak, B. 2002. *Mûzîk Dans û Şarqiyêne Kurdi*. Enqere: Öz-ge
- Hesenpur, E. 1997. *Kürt Dili ile İlgili Devlet Politikalari ve Dil Hakları*. İstanbul: Avesta
- Izady Mehrdad.R. 2004. *Kürtlər*. İstanbul: Doz
- Korkmaz, M. 2002. *Çifte Standardın Adı Kurdi*: Özü Kürt Sözü Türk. Ankara: Öz-Ge
- Parlıltı, A. 2006. *Dengbêjler, Sözün Yazgısı*. İstanbul: İthaki
- Valî, A. 2005. *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihsel Kökeni*. İstanbul: Avesta

